şopdara rastiyê ye
# Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 496 26-Mijdar- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî










## Li kolanên Şêxmeqsûdê nav û nîşanên berxwedanê

Pirraniya caran navên kolan û dikanan wateyên cuda didin û çîroka berxwedanekê yan jî têkoşerekî/ê vedibêjin. Li taxa Şêxmeqsûd a Helebê navên dikanan bala mirovan dikişînin. Bi vê yekê welatî dixwazin berxwedan û têkoşeran bi bîr bînin.
Navên dikanên taxa Şêxmeqsûd a Helebê yên ji hev cuda, bala mirov dikşîniin. Xwediyên dikanan dikanên xwe bi navên nîşaneya deverekî ku li ber xwe daye, yan jî ji hêla artêşa Tirk a dagirker ve hatiye dagirkirin, an jî navên têkoşeran bi nav kirine.
Berxwedana welatiyên taxa Şêxmeqsûd û rojavayê Kurdistanê di dirêjahiya salên şoreşê de têrê dike ku welatî navên berxwedanê li dikanên xwe bikin.
Pirraniya xwediyên dikanên Şêxmeqsûdê navên wekî “Avesta, Kobanê, Evîndar Efrîn, Cindirêsê, Bakur, Cizîrê, Eyn Dîwar, Qamişlo û Rojava” li dikanên xwe dikin. Şênî bi vê yekê dixwazin peyamekê bidin.
Têkildarî mijarê xwediyê dikana bi navê ‘Efrîn’ a bazirganiya erebeyan Ismaîl El-Şêx yê ji Kobanê xivî û sedema binavkirina dikana xwe bi navê ‘Efrîn’ wiha vegot: “Berê rêjîma Sûriyê binavkirina dikanan bi navên kurdî qedexe dikir. Lê îro rewş cuda ye. Ji bo ku berxwedana wê ji bîr nebe û her kesek di ber dikanê re çû û hat navê wê bixwîne, min navê dikana xwe kir ‘Efrîn’.”
Ismaîl wiha dewam kir: “Her çi qas çete me bidin koçberkirin, em dest ji rêgezên xwe bernadin. Bila bizanibin em bi berxwedana xwe ve girêdayî û em ê dest ji xaka xwe bernedin.”
Di dawiyê de Ismaîl El-Şêx diyar kir ew nav, wê di bîra wan de bimînin û wê berxwedan û rastiya ku li wan herêman qewimiye, ji cîhanê re ragihînin...*ANHA*






## Ji gundê Meredo çend dîmenên payîzê



Gundê Meredo yek ji gundên Çiyayê Qendîlê ku di demsala payîzê de xweşikbûna wê balê dikişîne û dibe xwedî dîmenek xweşik. Mirov temaşe neke, mirov nikare bi rêbarî têre derbas bibe.
Gundê Meredo ser bi bajarokê Jarewe yê Piştder e, niha nêzî 10 malbat lê dijîn. Bi xwedîkirina lawiran û çandiyê ve mijûl dibin. Ji ber xweşikbûna gund, di hemû demsalên salê de geştyar serdana gund dikin. Lê, ji ber ku di demsala payîzê de xwezaya gund xweşiktir dibe, mêvanên wê zêdetir dibe...*ROJNEWS*



## Avahiyên dîrokî li ber hilweşînê ne

Li Silêmaniyê gelek avahiyên dîrokî ku di dîrokê de navendên çand, siyaset û wêjeya bajêr bûn li ber wêranbûnê ne. Heta gelek ji van avahiyan wêran bûne jî. Eger wiha tedbîr neyên girtin wê di nava çend salên din de yên mayîn jî hilweşin.
Li Taxa Sabunkeranî ya Silêmaniyê gelek avahiyên dîrokî hene. Gelek ji van xaniyan ji ber bêxemî û nûjen nekirinê xerabûne û hinek jî di bin metirsiya hilweşînê de ne. Gelek xanî jî hatine xerakirin û di şûna wan de avahiyên nû û rawestgehên wesayîtan hatine çêkirin.
Ev avahiyên dîrokî, beşek ji dîroka Silêmanî ya wêje, siyaset û ci-





vaka wê ne. Her avahiyek ji van xwediyê çîrokên taybetin. Her çiqas ku hinek ji van avahiyan ji aliyê Rêveberiya Şûnwarî ya Silêmanî ve hatine vekirin jî, lê ji ber ku nehatine nû kirin, roj bi roj metirsiya hilweşînê li ser zêde dibin.
Di derbarê vê mijarê de dîroknasê Silêmaniyê Fayeq Hemesalih ku lêkolînê li ser avahiyên dîrokî yên bajarê Silêmanî dike, got: “Ev avahî ji bo bajarê Silêmanî xwedî girîngiyekî siyasî, wêjeyî, civakî û dîrokî ne. Eger neyên nûkirin piştî çend salek din mixabin dibe ku hilweşin.”
Xaniyê dîrokvanê Kurd Emîn Zekî Beg jî yek ji wan e. Li cihê xaniyê wî ti şopek nemaye û niha bûye cihê rawestgeha wesayîtan.
Fayeq Hemesalih li ser xaniyê Emîn Zekî Beg got ku ev xaniyê ku niha bûye cihê rawestgeha wesayîtan yê dîrokvanê Kurd Emîn Zekî Bege û got; “Ew dîrokvanekî mezin ê gelê Kurd bû. Heya par jî ev xanî dima. Di vî xanî de dîroka Kurd û Kurdistanê nivîsandiye. Li şûna ku xanî bikin muzexane, lê mixabin hatiye rûxandin û bûye rawestgeha wesayîtan.”
Avahiyek din xaniyê helbestvanê navdarê Kurd Pîremêrd e. Ji bo ev xanî ne hilweşe û wekî bîranînek ya bajarê Silêmanî were parastin malbata Celal Îbrahîm ev 42 sale bi malbata xwe re di nava xaniyê helbestvanê Kurd Pîremêrd de dijî û diparêze. Celal Îbrahîm sedemê mana di vî xanî de wiha got, “Tenê ji bo ev xanî xera nebe, ez têde mame. Heya niha du car min bi xwe beşek ji vî avahiyê nû kiriye. Beşek din jî ji aliyê Rêveberiya Şûnwarî ya Silêmanî ve hatiye nûkirin.
Celal bal kişand li ser bîranîna xanî û got; “Di nava hewşê de hewuzek hebû, êvaran civîn û hevdîtina helbestvan û dostên Pîremêrd tê de çêdibûn. Pîremêrd bi xwe li ser serban rûdinişt û li hevdû guhdar dikirin û gufrûgo li ser helbest û wêjeya Kurdî dikirin.”...*ROJNEWS*

şopdara rastiyê ye
# Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 496 26-Mijdar- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî


## QSD’ê êrîş têk bir, 20 çete hatin kuştin



Çeteyên DAÎŞ’ê ji bo pêşî li pêşveçûna şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bigirin, li eniyên bakur û rojavayê Hecînê bi wesayitên bombebarkirî êrîş birin ser nuqteyên şervanan. Şervanên QSD’ê bersiv dan çeteyan û êrîş şikandin. Di şer de 20 çete hatin kuştin û cenazeyên gelek çeteyan jî li qada şer mane.*R-2*

# OCALAN HÊVIYA GELAN E

**Tecrîda gîran ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam dike. Fikarên di derbarê jiyana Rêber Ocalan de jî her diçe zêde dibe. Li welat û derveyî welat gelê Kurd û dostên xwe ji bo Rêber Ocalan di nava tevgerê de ne.**



## OCALAN JI BO KURDAN XETA SOR E

Hevseroka Giştî ya HDP’ê Pervîn Bûldan diyar kir ku tecrîd sûcekî li dijî mirovahiyê ye û destnîşan kir ku divê tecrîdkirina Ocalan tavilê biqede. Bûldan got, Birêz Ocalan ji bo Kurdan xeta sor e.” Hevserokê KCD’ê Berdan Ozturk jî ku tevlî kongreya Meclîsa Ciwanên HDP’ê bû axivî û got, Ocalan ne tenê ji bo gelên Tirkiyê, ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn bûye hêvî.” Di şexsê Ocalan de aştiya Rojhilata Navîn tê astengkirin.” *R-4*

## DIVÊ LI DIJÎ TECRÎDÊ TÊKOŞÎN XURT BIBE

Çalakiya greva birçîbûnê ya Nûnbertiya HDP’ê ya li Hewlera Başûrê Kurdistanê ya li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan berdewam dike. Di roja 5’emîn de koma sêyemîn çalakî dewr girt. Nûnerê HDP’ê yê Başûrê Kurdistanê Abid diyar kir heta ku tecrîdkirina Rêber Apo bi dawî nebe wê çalakiya wan berdewam bike. Welatiyên Efrînê yên ku di salên berê bi Rêber Ocalan re rûniştine diyar kirin ku ji bo rakirina tecrîdê divê tekoşîn were bilindkirin. *R-5*

## Di sala 41’ê de wê serkeftin mezin be



Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Dûran Kalkan diyar kir ku ew dersên rexnedayinê ji sala 40’î derdixînin û li ser vê bingehê hîn bi rêxistinî, bi biryar û bi plan dest bi sala 41’ê ya PKK’ê dikin. Kalkan wiha got, “Em ê sala 41’ê bikin sala têkoşîneke xurt. Di vê salê de em ê hîn bi xurtî bi ser bikevin.” *R-4*

## Gerîlayan salvegera damezrandina PKK’ê pîroz kir



Salvegera damezirîna 40’î ya PKK’ê li Zagrosan bi tevlêbûna bi sedan gerîlayan bi rengekî bi heybet hate pîrozkirin. Endamê Biryargeha Navendî ya Parastina Gel Amed Malazgirt di merasîma pîrozbahiyê de axivî û diyar kir ku wan 40 salên dagirtî li pey xwe hiştin û got, “Di sala 41’ê ya PKK’ê de wê destanên serkeftinê yên mezin werin nivîsandin.” *R-2*

## Li Bakurê Sûriyê meşên 25’ê Mijdarê hatin lidarxistin



Bi munasebeta 25’ê Midjarê Roja Têkoşîna li Dijî Şideta li ser Jin ya Navnetewî li gelek bajarên Bakurê Sûriyê meşên girseyî hatin lidarxistin. Bi sedan jin û mêr beşdarî meşên ku li Qamişlo, Şehba û Girê Spî hatinlidarxistin, bûn. Di meşan de behsa girîngiya berxwedan û têkoşîna jinan ya azadiyê û li dijî tundiyê hate kirin. *R-2*

## Ji bo vegera Efrînê berxwedana me didome

Endama Rêveberiya Yekîtiya Jinên Êzidî Gulê Cafer diyar kir ku, bi projeya Neteweya Demokratîk a li Rojava re hemû gel bûne xwedî maf û anî ziman, dewleta Tirk ji vê rewşê aciz e. Gulê Cafer diyar kir, jinên Efrînî yên li Şehbayê ji bo vegerin Efrînê berxwedana xwe dewam dikin. *R-3*



## Emê têkoşîna xwe mezintir bikin

Endama Koordînasyona Kongreya Star Hêva Erebo bi munasebeta 25’ê Midjarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinan ya Navnetewî axivî û diyar kir, di dema rejîma Baasê de jin dibûn hedefa tundiya mêr û dewletê û got, “Şoreşa Rojava bû hêviya hemû jinan.” Hêva desnîşan kir ku ew ê têkoşîna xwe ya azadiyê mezin bikin. *R-3*



## Divê welatiyên Bakurê Sûriyê rê nedin fitneyan



Hevserokê Meclisa Sûriya Demokratîk MSD’ê Riyad Derar têkildarî gefên Tirkiyê yên li ser Bakurê Sûriyê û hewldanên derxistina fitne û tevliheviyan axivî û diyar kir ku divê welatiyên Bakurê Sûriyê rê nedin fitneyên hevalbendên Tirkiyê û DAIŞ’ê û bi derewên wan nexapin. *R-4*

## Li dijî planenên navnetewî divê yekîtiya netewî ava bibe



Endamê Rêveberiya Yekgirtû ya Îslamî ya Kurdistanê Ebûbekir Helednî derbarê biryara DYE’ê û Dîwana Edaletê ya Ewropayê de axivî û diyar kir ku Emerîka û Ewropa di derbarê pirsgirêka Kurd de du rû tevdigerin. Helednî destnîşan kir ku planên navnetewî yên li dijî Kurdan tenê bi yekîtiya netewî dikarin bên vala derxistin. *R-5*

# QSD'ê êrîş têk bir, 20 çete hatin kuştin

**Çeteyên DAÎŞ'ê ji bo pêşî li pêşveçûna şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bigirin, li eniyên bakur û rojavayê Hecînê bi wesayitên bombebarkirî êrîş birin ser nuqteyên şervanan. Şervanên QSD'ê bersiv dan çeteyan û êrîş şikandin. Di şer de 20 çete hatin kuştin û cenazeyên gelek çeteyan jî li qada şer mane.**



Êrîşên çeteyên DAÎŞ'ê yên li herêma Hecînê ji aliyê şervanên QSD'ê ve hatin têkbirin. Di şer de 20 çete hatin kuştin.
Çeteyên DAÎŞ'ê ji bo pêşî li pêşveçûna şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bigirin, li eniyên bakur û rojavayê Hecînê bi wesayitên bombebarkirî êrîş birin ser nuqteyên şervanan. Hêzên QSD'ê di cih de bersiv dan çeteyan û êrîş şikandin.
Li gorî nûçeya ANHA'yê ku agahiyên xwe ji çavkaniyên leşkerî digire, di şer de herî kêm 20 çete hatin kuştin. Cenazeyên gelek çeteyan jî li qada şer man.

## Gerîlayan salvegera damezrandina PKK'ê pîroz kir



Salvegera damezirîna 40'î ya PKK'ê li Zagrosan bi tevlêbûna bi sedan gerîlayan bi rengekî bi heybet hate pîrozkirin.
Gerîlayên HPG û YJA STARê li Zagrosan Cejna Vejînê ya 27'ê Mijdarê bi coşeke mezin pîroz kirin. Di pîrozbahiyê de ku bi sedan gerîla amade bûn, yek ji Fermandarê Biryargeha Navendî ya Parastina Gel Amed Malazgirt, fermandarên HPG û YJA STARê Seyîdxan Dersim, Pelşîn Koçgirî, Egîd Kelar û Axîn Ararat amade bûn.
Endamê Biryargeha Navendî ya Parastina Gel Amed Malazgirt di merasîma pîrozbahiyê de axivî, salvegera damezrandina PKK'ê li Rêber Ocalan, gelê Kurd û gêrîla pîroz kir û wiha got."Tevgera PKK'ê 40 salên tije li pey xwe hiştin û dastanên mezin nivîsîn. PKK beriya niha bi 40 salî di şertên dijwar de, dema ku gelê Kurd bi temamî dihate tinekirin hate avakirin. Di serdemeke wiha de Rêber Apo bi gotina ''Kurdistan heye û mêtingeh e'' bi komeke hevalê xwe re dest bi xebatên rêxistiniyê kir. Pêngava ku hebûna Kurdan û Kurdistanê bide qebûlkirin avêt. Ne tenê li Kurdistanê li metropolên Tirkiyê jî ev rêxistinî kir û geşedaên mezin bi xwe re anîn. Li bara van geşedanan dewleta TC'ê ya mêtinger jî li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê êrîşên mezin da destpêkirin.
Dewleta Tirk çawa ku bi hemû derfetên xwe şer bi teknîkê rê ve dibe, em ê jî vê teknîkê bi kar bînin. Me gava vê avêt, hêdî hêdî em ê vê geş bikin. Li gel vê, em gerîlayên PKK'ê bi taktîkên gerîlayê modern em ê asta têkoşînê geş bikin. Me 40 salê têr û tije, bi lehengiyê tije li pey xwe hiştin. Dîrok, ji niha û şûn de li ser xeta têkoşînê ya Rêber Apo, wê şahidî ji dastanên mezin re bike. Dîrok wê vê şanî û dost û dijminan bide."

## YPG'ê wesayiteke çeteyan teqand

YPG'ê li ser rêya gundê Birc Heyder ê navçeya Şêrawa ya Efrînê li dijî wesayiteke çeteyan çalakiya sabotajê kir. 2 çeteyên di hundirê wesayitê de bûn bi giranî birîndar bûn.
Navenda Ragihandinê ya YPG'ê li ser çalakiya li Şêrawayê li dijî çeteyên Feylaq el-Şam hate kirin daxuyaniyek weşand. YPG'ê diyar kir, di çarçoveya qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê ya Efrînê de çalakiyên li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên wê yên çete dewam dikin.
Di daxuyaniyê de li ser çalakiya li Şêrawayê ev agahî hatin dayin: "Roja 24'e Mijdarê li ser rêya gundê Birc Heyder ê navçeya Şêrawayê, tîmeke me li dijî wesayiteke koma çete ya bi navê Feylaq el-Şam çalakiyeke sabotajê pêk anî. Di encama vê çalakiyê de 2 çeteyên di hundirê wesayitê de bûn bi giranî birîndar bûn."



## Li Idlibê sivîl tên revandin û kuştin



Şêniyên gundê Batenta yê bakurê Idlibê cenazeyên 4 kesên ji destan ve girêdayî û di serê wan de gule hatine teqandin, dîtin. Çavkaniyan diyar kir ku 4 kesên ku hatine kuştin, sivîl in û ji aliyê Heyet Tehrîr El-Şam ve ji ber fîdye nedane wan, hatine kuştin.
Li gor nûçeya ANHA'yê çavkaniyên ji gundê Batenta yê bakurê Idlibê diyar kirine ku şêniyên gund 4 sivîl di nav zeviyên çandiniyê de bi awayekî kuştî dîtine.
Çavkaniyan da zanîn ku cenazeyên ku hatine dîtin ên sivîlan in, lê ji ber çeteyên Cebhet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nursa) fîdye ji xizmên wan ji bo serbestberdanê xwestibûn û wan nikarî bida, ew kuştin.
Çavkaniyekî herêmî derbarê zêdebûna girtiyan de ji aliyê Cebhet Tehrîr El-Şam ve, diyar kir li bajarokê Harim ê ku dikeve bakurê rojavayê Idlibê, çete sivîlan bi tawana têkiliya wan bi rêjîma Sûriyê re heye, direvînin.
Çalakvanan dîmenên sivîlên bajarokê Harim ku ji aliyê çeteyên Cebhet El-Tehrîr El-Şam ve tên îşkencekirin, weşandin.
Çavkanî da zanîn ku kesên hatine revandin ji şêniyên Harim in, çete ji bo serbestberdana wan 5 hezar dolarên Emerîkî wek fidye xwestiye.
Çavkaniyan destnîşan kir ku zêdetirî 4 hezar girtî di zindanên Cebhet El-Tehrîr E-Şam de hene.

## Balafirên Rûsyayê 'herêma bêçek' bombebaran kir

Yekem car ji dema Rûsya û Tirkiyê 17'ê Îlonê li ser herêma bêçek lihevkirin, balafirên Rûsyayê herêma bêçek bombebaran kir.
Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê ragihand ku balafirên Rûsyayê êrîşên dijwar birin ser herêma başûrê rojavayê Ildibê. Hêjayî gotinê ye ku herêmên ku ji aliyê Rûsyayê ve hatine bombebarankirin, di 17`ê Îlonê de di encama lihevkirina Pûtîn û Erdogan de wek herêmeke bêçek hate ragihandin.
Li gorî navendê, balafiran herêma El-Raşidîn a rojavayê bajarê Helebê, herêma Xan Toman a li aliyê başûrê rojavayî bejahiya Helebê dikeve, bombebaran kir.
Ji aliyê din ve jî hêzên rêjîma Sûriyê herêmên rojava û bakurê rojavayê Helebê topbaran kirin.

### DERBARÊ BOMBEBARANÊ DE DAXUYANÎ

Wezareta Parastinê ya Rûsya ragihand ku balafirên Rûsya çekdarên ku roja berê Heleb bi çekên kîmyewî topbaran kir, tesfiye kirin.
Her wiha wezaretê da zanîn ku hin delîl hene çete amadekariyên êrîşeke din a kîmyewî dikin.
Piştî ku şeva din çeteyên artêşa Tirk a dagirker taxên bajarê Helebê bi bi çekên jehrî topbaran kirin, Rûsyayê êrîşên hewayî li dijî çeteyan pêk anîn.





## Li Bakurê Sûriyê meşên 25'ê Mijdarê hatin lidarxistin

Li gelek navendên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi minasebate 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Şîdeta li ser Jinan a Navneteweyî meş hatin lidarxistin. Li Qamişlo, Şehba û Girê Spî jin derketin qadan û şîdeta li ser jinan şermezar kirin.
QAMIŞLO
Bi hezaran şêniyên kantona Qamişlo bi wesîleya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Şîdeta li ser Jinan a Navneteweyî meşek li dar xist. Şandeyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, saziyên civaka sivîl û bi sedan welatî tev li meşê bûn. Meş li Stada Şehîd Heysem Kuço veguherî mitîngê. Di mitîngê de hevseroka Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê Foza Yûsif axivî û destnîşan kir ku tundiya li ser jinan binpêkirina mafên mirovan e û got, "Li Rojava û Bakurê Sûriyê şoreş bi pêşengiya têkoşîn û îradeya jinan pêşket."
ŞEHBA
Bi hezaran jinên kantona Efrîn û Şehbayê bi wesîleya 25'ê Mijdarê meşek li Şehbayê li dar xist. Meşa ku li gundê Ehdesê pêkhat li qada gund veguherî mitîngê. Di mitîngê de endama Kongreya Star a kantona Efrînê Şîraz Hemo axivî û destnîşan kir ku meşa wan mînaka îrade û berxwedanê ye û got ew tu carî derfetê nadin tu kesî ku şîdetê li jinan bikin.
GIRÊ SPÎ
Bi dirûşmeya "Azadiya rêber Apo azadiya jinan e" şêniyên herêma Firatê bi boneya 25'ê Mijdarê, meşek li kantona Girê Spî li dar xist. Meşa ku bi pêşengiya Kongreya Star hat lidarxistin bi sedan şêniyên herêma Firatê beşdar bûn.
Li Qada Azadî meş veguherî mîtîngê. Paşê daxuyaniyek li ser navê Kongreya Star a kantona Girê Spî hate xwendin.
Piştî daxuyaniyê axaftin hatin kirin. Di axaftinan de behsa berxwedana jinên Bakurê Sûriyê hat kirin.



# Divê çanda gund bê parastin

***Jiyana li gunda sade ye û bingeha jiyana civakî ye. Jiyanê li gundan destpêkiriye. Îro jî li Kurdistanê jiyana herî sade li gundan e. Jina bi navê Fatma Hiso ya ji gundê Dawudiyê ya Til Temirê diyar kir ku gund bingeha çand û hunerê ye û anî ziman ku divê çanda gund bê parastin.***



Jina bi navê Fatma Hiso behsa jiyana li gundan kir û da zanîn ku gund dibistan e û wiha got: "Gund bingeha çand û hunerê ye."
Jiyan û çanda ku li gundan tê jiyîn heta roja îro jî gelek tişt bi xwe re aniye. Jina bi navê Fatima Hiso ya 80 salî û li Gundê Dawudiya Bajarê Til Temir dimîne da zanîn ku ew ji parastina çanda li gundan gelek hez dike û wiha got: "Xwedîderketina çanda li gundan ji bo siberojê gelek girîng e. Divê em çanda li gundan bigihênin nifşên din jî."

### LI GUND EM GELEK TIŞT FÊR BÛN

Fatimayê wiha got: "Li gund em hînî gelek tiştan bûn. Jiyana li gund ji ber kêmderfetiyan hem dijwar e hem jî xweş e. Berê ji bo avê em bi qantiran di rêyên dirêj de diçûn da ku em alavên ku pêdiviya me pê heye bînin. Her wiha me karê çandiniyê jî dikir. Em diwestiyan lê em bextewar bûn. Niha jî em ji bo pêdiviyên xwe yên rojane di hawanê de genimê xwe dikutin."
Fatima Hiso herî dawî wiha got: "Gund bingeha çand û hunerê ye. Xwedîderketina çanda li gundan ji bo siberojê gelek girîng e. Divê em çanda li gundan bigihênin nifşên din jî."…*JINNEWS*

## Em ê bi dengbêjiyê zimanê xwe biparêzin



Dengbêjên bi dirûşmeya "Serê malê kilamek" her hefte li malekê ne, diyar dikin ku li wan bajarên ku koçî wan kirine ancax bi kilaman dikarin li gor ziman û çanda xwe bijîn.
Dengbêjên li bajarê Tirkiyê Mêrsînê bi pêşengiya hunermendên Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) ya ku hat girtin bi dirûşmeya "Serê malê kilamek" her hefte dibin mêvanê malekê. Ji wan dengbêjan gelek jê bi salan e ji warê xwe koçber bûne û niha jî bi şevbuhêrkan hesreta xwe ya ji bo warê xwe tînin ziman.
Dengbêj Îsa Tarhan (58) ku di sala 1993'yan de ji navçeya berwarî ya Sêrtê koçî Mêrsînê kiriye, bal kişand ser girîngiya xwedîderketina li çanda dengbêjiyê û got: "Berê me li gund dengbêjî ddikir. Lê wê çaxê me di cihên wekî ên niha de nedigot. Wexta em hatin vir êdî bi saya hunermendên NÇM'ê derfeteke wisa jî çêbû. Wan em anîn cem hevdu. Bi saya wan bi salan e em tev li bernameyên Newrozan û televîzyonan bûn." Tarhan, diyar kir ku bi wan bernameyan wan careke din çanda dengbêjiyê ji gel re vegotiye.

### EM Ê VEGERIN GUNDÊ XWE

Tarhan, anî ziman ku dengbêjî ji bo wan gelek girîng e û got: "Wexta distrêm gundê min, bajarê min tê bîra min. Bîranên xwe yên li gund hemûyan li kilaman bar dikim. Çi qasî zêde bistrêm bêrîkirina min ew qasî zêde dibe. Êdî dixwazim vegerim gundê xwe. Ger şer bi dawî bibe em ê vegerin gundê xwe."
Kamîle Demîr (53) ku di sala 2008'an de ji gundê Hîrît ê Sêrtê koç kir, anî ziman ku ji ber zext û zoriyan wan koç kiriye lê belê heman zext li vir jî hene. Demîr, diyar kir ku ji zarokatiya wê ve bala wê li ser dengbêjiyê bûye û got: "Bi rastî jî wexta nestrêm, nexweş dikevim."

### DIVÊ KILAMAN FÊRÎ ZAROKAN BIKIN

Demîr, bang li hemû jin û ciwanan kir ku xwedî li çanda dengbêjiyê derkevin û got: "Bila mirovên me çanda xwe ji bîr nekin û hînî zarokên xwe jî bikin. Ez jî hînî zarokên xwe dikim. Divê em vê çandê nifş bi nifş veguhêzînin." Demîr, destnîşan kir ku wextae distrê ew ber bi warê xwe ve diçe û pir rihet dibe. Demîr got: "Wexta distrêm bêrîvanî û çêrandina pez tê bîra min. Rojên min ên evîndariyê tên bîra min. Ger rojekê dawî li şer bê ez berê xwe bidim gund. Divê êdî dawî li vî şerî bê."
Remezan Eren (55) jî destnîşan kir ku ew ê bi dengbêjiyê zimanê xwe biparêzin. Eren got: "Em dengbêj çand û zimanê xwe nifş bi nifş vediguhêzînin û diparêzin. Bang li hemû dengbêjan dikim, ji bo berbelavkirina çand û zimanê me werin em li taxên xwe çalakiyên bi vî rengî bikin."…*MA*

## Di hevdîtina Germiyan de 5 kurte film hatin pêşandan



Di roja sêyemîn a hevdîtina hunerî ya Germiyan a ji bo sînema û şano li ser mijara aktor û hunera drama dewam kir.
Li Hola Hunerî ya navçeya Kelar a Germiyan hevdîtina hunerî ya Germiyan a ji bo sînema û şano di roja sêyemîn de li ser mijara aktor û hunera drama berdewam kir.
Di destpêkê de Dr. Safre Nacî li ser bihêzbûna hizrê aktor axivî û diyar kir ku divê aktor rolekî girîng di karê şano û sînemayê de bilîzin û got; "Li Iraqê bi giştî di warê aktoran de lewazbûn heye. Ev lewazî jî bûye sedem ku weke pêwîst rol neleyîzin."
Piştre Yasîn Qadir Berzencî derbarê hunera drama de axivî û diyar kir ku ji bo berhemên sînema û drama bi serketî bin, divê hemû aktor weke hev aktîv bin û got; "Girantirîn û hêsantirîn beşê hunerê nîşandane. Lewma ger rolê sereke bibînin, dibin xwedî helwest. Mixabin, hunera Kurdî bi xwe sedeme ku xelk temaşeyî rêzefilmên dublajkirî bikin."
Herwiha di beşê dawî de 5 kurte filmên bi navê Bûn le Şarit, Evînî Quligan, Cêzwan, Qeder, tawan û dirû û Boyinbaxe xet xeteke hatin pêşandan…
*ROJNEWS*



## Kurd çereseriyê bê rêya aştiyê dixwazin

Derwêş M. FERHO

Çardeh sal lêkolîn li ser pirsgirêka Kurdistan. Ew bi tu awayî terorîzmê napejirînin, têkoşîna mafên xwe yên neteweyî dikin. Yanzdeh pirtûk encama vê xebatê. Ya duwanzdehemîn di rê de ye. Bi awayekî zanistî analîzên dîrokî, olî, felsefî, antropolojî û civakî, di vê xebata hêja de hatiye kirin.
Gotinên jor pêşgotina ji aliyê Prof. Dr. Dirk Rochtus di roja 23.11.2018 de bi minasebeta nasandine pirtûka Hugo van Rompaey di dezgeha ADVN (Navenda arşîf û dokumentasyonê) li bajarê Antwerpen dihat kirin. Di heman demê de rêzdar Rochtus serokê vê navendê ye. Ew di pirsgirêka Kurdî û siyaseta Riojhilata Navîn de pîspor e.
Di axaftina dawîn de serokê Komxebata Parlementeran ji bo pirsgirêka Kurdî li Parlementoya Beljîka Jan Béghin, cîgirê kevn yê serokê Parlementoya Brukselê bi awayekî fereh xebata H. Van Rompaey şîrove kir. Girîngiya vê xebatê di warê siyasî, civakî û zanistî de kir. Bê goman, behsa serokê kevn yê vê komxebata parlementeran Lionel Vandenberghe, senatorê kevn û serokê kevn ji bîr nekir. Ev meriv jî di nava guhdaran de amade bû.
Di aliyê din de Hugo Van Rompaey di şîroveya xwe ya vê çalakiyê de bi berferehî li ser daxazên Kurdan û kiryarên wan sekinî. Daxwaz û têkoşîna Kurdan, ya tevgera Azadiya Kurdistan û bersivên dewleta Turk dan ber hev. Wî têkoşîna Kurdan di çardeh xalan de dubare kir. Ku Tevgera Azadiya Kurdistan ji sala 1993 ve deh car zêdetir agirbesta yekalî pêkaniye. Bersivën dewleta Turk jî her tim bi xap, bombe, tank û çekên giran bû ye.
Rêzdar Hugo Van Rompaey, di dawiya 1998 de serok Öcalan li Roma dît û pê re dûr-dirêj axivî. Di axaftina xwe de H. Van Rompaey behsa van 14 pêşniyarên Serok dike. Paş vê hevdîtinê H. Van Rompaey vedigere Brukselê û raste rê diçe ba serokwezîrê wê demê Jean Luc Dehaene û jê daxwaza inisiyatîfek Ewropî dike. Lê mixabin, pêkhatin û bûyerên paş vê demê rê li ber her gava erênî digre.
H. Van Rompaey diheman demê de bal kişand ser rastiya ku Kurdan di şerrê DAIŞ'ê de peywîra xwe bi cî anîn. Siyaseta navdewletî di destpêkê de Kurd pîroz kirin, lê di roja îro de weha xuya ye ku ewê dîsa pişta xwe bidin Kurdan. Wî ev siyaset bi xiyaneta di hember Kurdan de bi nav kir.
Her sê rêzdaran bi berferehî bal kişand ser rewşa îro li Turkiyê û behsa siyasetmedarên Kurd kir. "Eger bi dehan parlementer, şahredar, rewşenbîr, çalakvanên mafêne mrovan li Turkiyê di girtîgehan de bin çawa Ewropa dikare bi rayedarên Turk re pêvajoya endametiya Turkiyê biaxive. Divê Ewropa peywîra xwe di çarçeweya bingeha demokrasiyê de ku îro YE pê dijî bi cî bîne. Divê YE bi serbilindî di hember durûtiya Pûtîn, Trump, Erdogan û Asad de zelal û heşkere biaxive.
Kurd, bi daxwazên xwe ji bo jiyaneke bi rûmet neheqiyê li tu alî nakin. Têkoşîna wan ji bo aştiyê, demokrasiyeke bi bingeh li ser esasê, jiyanek hevrayî, wekheviya mafan û pêdiviyan e. Tevgera Azadiya Kurdistan yekane dost û hevalbendên me yên durust in. Di vê çarçeweyê de bi tu awayî zor û zilma li ser vî gelî, neheqiya li ser tevgera wan û rêber û siyasetmedarên wan ku ji dev salan vir de di zîndanê de ne û revebirên ku li serê çiya vê tevgerê bi re ve dibin nayê pejiranidin. Kurdistanî, bi girseyî li pey van rêbêrên xwe ne û divê YE vê rastiyê bibîne.

# Oldaran banga diyalogê kirin

**Kombûna Oldaran û Baweriyan li herêma Cizîrê roja 24'ê Mijdarê li mizgefta El-Tikiyê El-Qadiriyê ya li Amûdê pêk hat. Piştî kombûnê encamname hat xwendin. Di encamnameyê de banga rawestandina şer û destpêkirina danûstandinan hate kirin. Her wiha bang li xêrxwaz, hezkiriyê aştiyê û rêxistinên mirovî hat kirin ku li hemberî êrîşên li ser gel û axa Sûriyê bêdeng nemînin.**



Encamnameya Kombûna Oldaran û Baweriyan li herêma Cizîrê eşkere bû. Di encamnameyê de banga danûstandinan hate kirin.
Kombûna Oldaran û Baweriyan li herêma Cizîrê roja 24'ê Mijdarê li mizgefta El-Tikiyê El-Qadiriyê ya navçeya Amûdê a kantona Qamişlo pêk hat.
Di kombûnê de gelek oldar, pêkhate û baweriyên ji ola Islamê, Xirstiyan û Êzîdî ji herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê amade bûn. Her wiha di kombûnê de rûspiyên êlên Ereban, nûnerên buroya têkiliyên QSD`ê û şêwermendê fermandariya giştî yê kar û bare sivîl ê QSD`ê amade bûn.
Piştî axaftinan encamnameya kombûnê ji aliyê Serokê Buroya Têkiliyên Olî yê herêma Cizîrê Mihemed El-Qadirî ve hate xwendin.
Encamname wiha ye:
"Birayên me yên rêzdar; di kombûna me de hezkiriyên aştiyê yên ji hemû bawerî, ol û mezheb amade bûn. Beşdaran teqezî li ser girîngiya parastina xaka pîroz kirin û gotin ew ê talîmatên xêr, biratî û reformê ku di pirtûkên me yên bang kirin, pêk bînin. Misliman banga aştiyê ya ku xweda bang dike guhdar dikin. Xiristiyan peyaman aştiyê ya hezretî Mesîh nas dikin ku di peyaman Colosse de hatiye vegotin. Êzidî dibêjin: Ehlê yezdan gulên di baxçeyan de ne û ehlê aştiyê ne.
Gelê bi rêz; em li vir kombûne da ku ragihanînin ku em aştiyê dixwazin û hewl didin wê pêk bînin. Em bang li hemû berpirsyaran dikin ku danûstandinên aştiyê bikin û ji zimanê çek û çer dûr bikevin. Êdî gelê me ji şer westiya ye, dem dema ku gelê me li welatê xwe yê ezîz xêrê bibîne.
Em ne siyasetmendar in, em oldar in, bi êşa gel dihesin û dizanin ku êş gelekî dirêj kir û destê derve di dirêjkirina vê aloziyê de ye. Her wiha em destwerdana Tirkiyê di karûbarê gelê Sûriyê de şermezar dikin û banga derxistina dagirkeriya Tirkiyê ji xaka xwe dikin. Her wiha em banga vegera li rêya rast û pêkanîna bangawaziyên gel dikin.
Heger ku Tirkiyê îdiaya edaletê dike em jê re dibêjin edaleta xwe pêk bînin, heger ku dibêjin em nûnertiya islamê dikin em musliman in û xwediyê baweriyê ne û cîranê we ne, mafê cîran kanî.
Di dawiyê de, em dûa ji xwedê re dikin ku nûrê aştiyê belav bibe û axaftina me ya vê civînê bibe gaveke pîroz a ber bi avakirina Sûriyeke demokratîk û aştî. Her wiha em bang li xêrxwaz, hezkiriyê aştiyê û rêxistinên mirovî dikin ku li hemberî gefên dijmin yên li ser gelê me derkevin."

## Li Reqayê xebatên şaredariyê

Şaredariya Gel a Reqayê ji rojên destpêkê yên rizgarkirinê ve gelek xebat kirine. Îro jî bi armanca guhertina rewşa xizmetguzariya bajêr hewl dide gelek projeyan pêk bîne
Şaredariya Gel a Reqayê di 2 mehên dawîn de gelek xebatên xizmetguzariyê di hemû aliyan de bi taybet beşa paqijiyê de, pêk anîne.
Şaredariyê hejmareke mezin ji taxên bajêr ên qerebalix paqij kirin. Her wiha şaredariyê rêyên bajêr ên şaxî û sereke ku zirar dîtine, qîr kirin. Bi hatina zivistanê re şaredarî neçar ma xebatên qîrkirinê rawestîne. Lê di havîna bê de dê van xebatan ji nû ve berdewam bike.

**KOMÎTEYA VEGUHESTINÊ**

Komîteya Veguhastinê ji Meclisa Sivîl a Reqayê 10 mîkrobasên din wergirtin. Niha hejmara mîkrobasan gihaşt 23'yan. Her wiha komîteyê xebatên amadekirina garaja sereke (El-Bolman) û garaja serwîsan a li kolana Deriyê Bexda didomîne. Ji aliyê din ve komîte ruxsetên ajokariyê dide ajokaran.
Şaredariyê û Komîteya Veguhastinê ji bo destpêka sala 2019'an plansaziyek daniye. Li gorî plansaziyê wê garajeke din a texsiyan were avakirin. Her wiha bi armanca veguhastina şêniyan derveyî Sûriyê xebatên amadekirina garajeke navdewletî ya tekane li bajarê Reqayê berdewam dike.

**KOMÎTEYA HAWÎRDOR Û PARKAN**


Piştî restorekirina parkên El-Reşîd, El-Bustan û Zarok û amadekirina lîstokên zarokan li wan parkan, komîteyê xebatên restorekirina parkên El-Istiqlal û El-Beyda didomîne.

**KOMÎTEYA AVÊ**


Werşeyên sererastkirinê yên girêdayî Komîteya Avê xebatên sererastkirina toreyên kanalîzasyonê û avê di nav taxên bajêr de didomîne. Heta niha komîteyê av bi rêjeya ji sedî 75 gihandiya şêniyan. Her wiha xebatên sererastkirina toreyên taxên El-Bedû, El-Idîxar, Basêl, El-Nehda û El-Firat berdewam dike.

**PAQIJÎ**

Şaredariya Gel a Reqayê bi koordîneya Meclisa Sivîl a Reqayê projeya paqijiyê di meha 6'an a 2018'an de bi lêçûna 456 hezar dolar dabû destpêkirin. Ev xebat heta roja me ya îro berdewam dike. Şaredariyê hemû dibistan û kolanên sereke yên bajêr paqij kirine û çop veguhastiye cihên diyar li derveyî bajêr.
Di çarçoveya projeyê de şaredariyê bi rêjeya ji sedî 70 ji taxên bajêr paqij kiriye. Her wiha xebat heta paqijkirina hemû taxên bajêr berdewam in.
Karîgerê Garajên Reqayê û Hevkarîgerê projeya paqijiyê Esad El-Mistefa têkildarî mijarê wiha got: "Piştî destpêkirina projeyê di di 6'ê Cotmehê de em xebatên projeyê didomînin."
Girêdayî heman mijarê serokê Şaredariya Gel a Navendî yê Reqayê Ehmed El-Ibrahîm ev tişt anî ziman: "Em pêşkêşkirina hemû xebatên xizmetguzariyê de berdewam dikin. Di sala 2019'an bi armanca pêşxistina bajêr ji aliyê xizmetguzariyê ve û peydakirina hemû pêdiviyên welatiyan em ê gelek projeyên xizmetguzariyê bidin destpêkirin."…*ANHA*




## Fedekariya malbata Apê Mistefa



Welatiyên Reqayê di şerê li dijî terorê de ewladên xwe kirin qurban. Apê Mistefa yek ji wan şêniyan e. Bavê 2 şehîdan û şervanekî QSD'ê ye. Apê Mistefa wiha dibêje: "Ne ji nexweşiya min bûya, min ê li rex kurê xwe li dijî terorê di heman xendekê de şer bikira."
Welatiyên bajarê Reqayê di dema serweriya çeteyên DAIŞ'ê de, gelek êş û zehmetî kişandin. Lê piştî rizgarkirina bajêr ji hêla QSD'ê ve, roja azadiyê li ser bajêr ji nû ve hilat û niha di nav aramî û ewlehiyê de ye.
Apê Mistefa 74 salî ye û ji Reqayê ye. Apê Mistefa li taxa El-Teyara ya rojavayê bajêr dimîne. Malbata wî mîna gelek malbatên Reqayê ji bo rizgarkirina bajêr fedakariyên mezin kirine.
Malbata apê Mistefa ji 7 kesan pêk tê. Du kurên wî tevî ku zewicîbûn jî tev li pêngava rizgarkirina Reqayê bûn û şehîd ketin.
Şehîd Emmar Mistefa El-Hemed bi nasnav 'Emmar Reqa' di sala 1994'an de ji dayîk bûye, zewicî bû. Şehîd Emmar piştî derketina malbata wî ji Reqayê, tev li QSD'ê dibe. Di 10'ê Cotmehê de li ber sûrên bajêr şehîd dikeve.
Birayî wî bi navê Ibrahîm ê bi nasnav 'Qenas' di sala 1995'an de ji dayik bûye. Zewicî bû û 2 zarokên wî hene. Ibrahîm piştî şehadeta birayê xwe Emmar 5 rojan, li bajarê Reqayê şehîd dikeve.
Her wiha kurê apê Mistefa Xalid bi armanca şopandina rêya her du birayên xwe yên şehîd tev li nav refên QSD'ê bûye. Niha ew di Şerê Tunekirina Terorê de di pêngava Bagera Cizîrê de cih digire.
Apê Mistefa yê bavê du şehîdan û şervanekî QSD'ê ye ku bi tevî hevjîn û keça xwe li taxa El Teyara dijî wiha got: "Niha kurê min Xalid li qadên şer li bajarê Dêrazorê ye. Ne ji nexweşiya min ya dil bûya min ê li rex kurê xwe li dijî terorê di heman xendekê de şer bikira."
Apê Mistefa wiha dewam kir: "Ji ber serkeftinên ku bi dest dixin, em spasiya QSD'ê dikin û em ê li ser rêya şehîdan bin û hemû xaka Sûriyê ji terorê rizgar bikin."…
*ANHA*

**RAMANÊ RÊBERTIYÊ**



## Ratiya Kurd -1-

**Abdulah Ocalan**

Hebûn û serwextî (şiûr-bîrbirin) pirsgirêka herî bingehîn a felsefeyê ye. Têgîna hebûnê hê jî yek ji têgînên sereke yên felsefeyê ye ku dibe mijara kakûnî û meraqê. Li ber serê vê têgînê cêwiya wê zeman heye. Herdu ji hev cuda nabin. Herçiqasî hebûn bêzeman nebe, zeman jî bêyî hebûn nabe. Zeman bi temamî bi hebûnê re têkildar e. Têkiliya di navbera herduyan de herî zêde bi têgîna bûyînê re heye. Hebûn û zeman ji sedî sed bi bûyînê pêk tên. Zeman di hebûnê de zorê dide bûyînê. Ya rastî, domdariya hebûnê bi bûyîn û qewimînê pêkan e. Em dema behsa hebûna di rewşa bûyîn û qewimînê de dikin zeman derketiye holê. Eger bûyîn hebe, li deverekê du çîçekên cuda hebin, li wir hebûn û zeman heye. Tinebûna bûyîn û qewimînê tê maneya tinebûna hem hebûnê hem jî zemanî. Bûyîn û qewimîn, rewşa hebûnê ya cudabûn û şêwegirtinê ye. Hebûna ne di rewşa bûyînê de ne hebûn e, zemanê tineye.
Rewşa bûyîn û cudabûnê, rewşa serwextbûnê ya xwedî potansiyel e. Cudabûn belkî jî gava pêşî ye ku ber bi serwextbûn û bîrbirinê ve tê avêtin. Kengî hebûn bi zeman re cuda bû, hingê serwextî û bîrbirin gava xwe ya pêşî diavêje. Çiqasî bûyîn, form û şêwe (hemû di heman maneyê de ne) hebin ewqasî jî serwextî û bîrbirin heye. Di çarçoveyeke gerdûnî de serwextî cudatî ye, serwextî jî weke kategorî rewşa giştî ya gerdûnî ya tevahiya serwextbûnên cudabûyî ye. Lê bêdawîbûna di forman de tê wê maneyê serwextbûn û bîrbirin jî bêdawî ne. Çiqasî formên cuda hebin, ewqasî jî serwextbûn û bîrbirinên cuda hene. Têgîna serwextbûnê (giyan) ya li cem Hegel beriya formê tê. Ya rastî, behsa serwextbûn û bîrbirineke bêform û şêwe tê kirin. Hegel, formê ji fizîka xwezayê dide destpêkirin heta bi dewletê dibe. Serwextbûn bi rêya forman xweber (bêform) dixwaze ji bo xwe li xwe serwext bibe. Serwextbûn û bîrbirin bi formên fizîkî, biyolojîk û civakî hem xwe piştrast dike, hem jî xwe nas dike. Serwextbûn û bîrbirina li cem mirov ew serwextbûn û bîrbirinek e ku li xwe hayil dibe. Serwextbûna felsefî rewşa serwextbûnê ya herî pêşketî ye; weke giyana (serwextbûna) li xwe hayilbûyî li rewşa xwe ya pêşî vedigere; lê bi awayekî li xwe hayilbûyî ango weke giyana mutleq. Em ji vê re dikarin serhatiya hebûn û zeman jî bibêjin. Di civakên Rojhilat de mirov zêdetir bi baweriyên dînî û tesewifê gihiştine vî şêweyê fikrê, lê civaka Rojava bi rêya zanist û felsefeyê xwe gihandiyê.
Ji bo mijara me ya girîng ew e, em têkiliya di navbera bûyîn-hebûn-serwextbûnê de zelal bikin û maneyê bidinê. Dema ku mijar Kurd bin, mirov ê karibe ji têgînên hebûn, bûyîn û serwextbûnê (bîrbirinê) gelek tiştan hîn bibe. Eger em Kurdan bi rewşa wan a hebûn, bûyîn û serwextbûnê bidin naskirin, ev yek wê ji bo fêhmkirina mijarê bibe bingeh. Ne dûr, heta beriya demekê, li gorî gelek civak û dewletan hebûna Kurdan cihê guftûgoyê bû. Di van dused salên dawiyê de ji bo piştrastkirin û îspata hebûna Kurdan, di çarçoveya modernîteya kapîtalîst de, belkî bi qasî Kurdan ti civak ewqasî li şîddetê rast nehatibe, ji aliyê naverok û şêweyê ve zordestî, înkar û îmha nedîtibe. Li ser Kurdan siyasetên qirkirinê yên fizîkî û çandî hatin meşandin. Li mekanê xwe yê esas (Kurdistan), çi ji aliyê fizîkî ve, çi jî ji aliyê çandî ve (zêhnî) hatin parçekirin û ji bo bêne tinekirin her cure amûrên zorê û îdeolojîk hatin seferberkirin. Mirov dikare bibêje, heta gihişt qirkirina bi destê modernîteya kapîtalîst, ti mekanîzmayên talan û zorê neman ku li ser nehatibin ceribandin. Kurdîtî ji vî alî ve diyardeyek wisa ye ku hemtayê wê nîne. Cihû ji bo qirqirînên xwe têgîna 'bêhemta, nedîtî, yekane' bi îhtîmam bi kar tînin. Ji bo Kurdan jî ne ku bi sedema qirkirina li ser wan meşandine, lê ji ber tevahî kirinên ew ji hebûnê derxistine mirov dikare gotina 'gelê yekane' yan jî 'yekane hebûna civakî ' bi kar bîne di cih de ye.



# Jinên Êzidî êdî dikarin xwe biparêzin

**Endama Rêveberiya Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) Neam Elyas diyar kir ku ger di dema fermanê de jinên Êzidî xwedî rêxistinbûna ewê dîl neketibana destê çeteyan û wiha got, "Jinên Êzidî êdî niha bi saya fikrên Rêber Apo bi rêxistinkirîne û dikarin xwe û civaka xwe biparêzin."**



Endama Rêveberiya TAJÊ Neam Elyas diyar kir ku eger jinên Êzidî di dema fermanê de rêxistinkirîbûna û hêza wan ya parastinê hebuya wê dîl neketibana destê DAIŞ'ê û got, "Jinên Êzidî yên di dema fermanê de rû bi rûyê her cûre êş û şîdetê man, niha dikarin xwe û civaka xwe biparêzin."
Endama Rêveberiya Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) Neam Elyas têkildarî têkoşîna jinên Êzidî ya li dijî şîdeta li ser jinê û rêbazên têkoşîna bi şîdetê re axivî.
Neam Elyas wiha got, "Jin jiyanê birêve dibe, ji ber vê jiyan bê jin nabe. Jin li her derê rastî şîdetê tê. Rojane jin tên qetilkirin. Divê ti jinek vê koletiyê û zilmê li ser xwe qebûl neke û têbikoşe."
Neam diyar kir ku jin gelek zirer ji şerên rû didin dibînin û wiha dewam kir, "Di dema fermanê de gelek jin dîl ketin destê DAIŞ'ê û hatin qetilkirin. Hîn jî gelek jinên Êzidî di destê çeteyên DAIŞ'ê de ne û çarenûsa wan jî ne diyare. Di her şerek û êrîşekî de jin dibe hedef."
Neam da zanîn ku civak hîn jî bi çavê namûsê li jinê dinêre û got, "Civak bi çavê namûsê li jinê dinêre, lê ji bo me axa me namûsa me ye. Eger axa me ne azad be emê nikarin bi azadî bijîn. Namûsa me ax û rûmeta me ye."
Neam di dewama axaftina xwede qala dema fermanê û nebûna parastina jinê jî kir û got, "Eger beriya fermanê hêza jinê ya parastinê hebuya, wê jin xwedî îradebuya û li hember êrîşan li berxwebida û neketiba destê çeteyên DAIŞ'ê. Lê jinên Êzidî ji vê ders derxistin û piştî fermanê îradeya xwe pêşxist. Niha jinên Êzidî ji herkesê re bûne nimûne. Jina Êzidî ya di dema fermanê de rastî şidet û êşkenceyê hat, niha dikare xwe û civaka xwe birêve bibe."
Neam da zanîn ku ew bi saya fikrên Ocalan bûne xwedî îrade got, "Em niha bi saya fikrên Rêber Apo rêxistinkirîne. Jin xwe li ser esasê fikrên Rêber Apo zana dikin û rêxistin dikin, ji bo vê jî divê xwedî li Rêber Apo derkevin. Rêber APO ji herkesê zêdetir qîmetê dide jinê. Di fikrê Rêber Apo de Jiyan, bê jinê nabe."
Di dawiya axaftinê xwede Endama Reveberiya Tevgera Azadiya Jinên Ezidî TAJÊ Neam Elyas bang li hemû jinan kir ku werin bi hevre Tekoşîna xwe bilind bikin û wiha got, "Ez bang li hemû jinan dikim ku werin bi hevre bi yek dest û yek dil têkoşîna xwe bilind bikin. Em tola jinên Êzidî hilînin û şideta li ser jinan bişkînin."…*ROJNEWS*

## Ji bo vegera Efrînê berxwedana me didome



Endama Rêveberiya Yekîtiya Jinên Êzidî Gulê Cafer diyar kir ku, bi projeya Neteweya Demokratîk a li Rojava re hemû gel bûne xwedî maf û anî ziman, dewleta Tirk ji vê rewşê aciz e.
Di dema dagirkirina Efrînê de civaka Êzidî jî bû hedefa êrîşên dewleta Tirk. Endama Rêveberiya Yekîtiya Jinên Êzidî Gulê Cafer bi bîr xist, ku fermana 73'an bi destê çeteyên DAÎŞ'ê ku pişta xwe didin dewleta Tirk, li civaka wan rabûye. Cafer diyar bir, bi saya berxwedana gerîlayên HPG-YJA Starê û şervanên YPG-YPJ'ê pêşî li komkujiyên giran hatiye girtin û got, dewleta Tirk mîna her carê dixwaze destketiyên gelê Kurd ji holê rake û îradeya Kurdan bişikîne.
Cafer diyar kir, bi projeya Neteweya Demokratîk a li Rojava û Bakurê Sûriyê re gel hemû bûne xwedî maf û got, "Vê yekê dewleta Tirk timî aciz kir. Piştî ku çeteyên DAÎŞ'ê yên sala 2014'an bi piştgiriya dewleta Tirk êrîş birin ser Şengalê, bi berxwedana gerîlayên HPG'ê û şervanên YPG-YPJ'ê têk çûn û Şengal azad bû, hesabên dewleta Tirk bi ser neket."
Gulê Cafer diyar kir, dewleta Tirk ji bo bêhnê bîne ber DAÎŞ a li ber tinebûnê ye, êrîş bir ser Efrînê û anî ziman, dewleta Tirk bi 58 rojan bi çekên NATO'yê êrîşî Efrînê kir, lê cîhan li pêşberî vê bêdeng ma."

**LI EFRÎNÊ QIRKIRINA ÇANDÎ TÊ KIRIN**

Cafer got, dewleta Tirk piştî ku Efrîn dagir kir li pêş çavên temamiya cîhanê li dijî gelê Kurd, bi taybetî Kurdên Êzidî qirkirina fîzîkî û çandî kir û wiha dewam kir: "Cihên dîrokî yên Êzidiyan dibin hedefa dewleta Tirk. Êzidiyên li wir man e her roj dibin hedefa êrîşan. Li gundê Qibarê bi dehan malbatên Êzidî, jin, mêr, zarok, extiyar hatine revandin û nayê zanîn bê niha li ku ne. Hewl didin bi darê zorê mirovên me bikin Misilman. Li gundên Êzidiyan qirkirina çandî tê kirin. Li gundê Basûfanê cara yekê ye ku mizgeftek hat çêkirin û Êzidiyan dibin wê derê ji bo bi zorê bikin Misilman. Mirovên me ji ber ku Misilmanbûnê qebûl nakin tên kuştin. Li gundê me dibistan vekirin, bi zorê ola Misilmantiyê hînî zarokên Êzidî dikin. Jinên Êzidî dilsozê xak û xwezayê ne, lê niha jinên Êzidî yên li Efrînê nikarin ji malê derkevin. Yên ku li dijî kiryarên derveyî mirovahiyê yên 58 rojan ên li Efrînê bêdeng man, hemû li ber pêngava Îdlibê rabûn."

**DEWLETA TIRK ÊRÎŞÎ JINÊN RÊXISTINBÛYÎ DIKE**

Bi wesîleya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Şîdeta li Jinê Cafer bang li hemû jina kir ku piştgiriyê bidin berxwedana jinên Kurd û YPJ'ê û got, "Dewleta Tirk û çeteyên wê, tundiya herî giran li Şengalê li dijî jinên Êzidî kirin. Bi hezaran jinên Êzidî hatin kuştin û bi hezaran li bazaran hatin firotin. Ya ku xwedî li van jinan derket, YPJ bû. Jinên Êzidî bûn xwedî rêxistin û azad bûn. Li Efrînê jî mîna Barîn Kobanê gelek jin hatin kuştin. Dewleta Tirk li pêş çavên tevahiya cîhanê êrîşî jinên bexwedêr dike. Divê em bi hev re dengê xwe bilind bikin, yekîtiya jinê ava bikin û pêşî li tundiya li jinê bigirin."
Endama Rêveberiya Yekîtiya Jinên Êzidî Gulê Cafer diyar kir, jinên Êzidî yên Efrînî li Şehbayê berxwedana xwe dewam dikin û got, "Piştî hezaran salî, yekemcar Rêveberiya Xweser a Efrînê ola Êzidî di fermiyetê de weke ol qebûl kir û Êzidî bûn xwedî mafê rêxistinbûnê. Li ser vê yekê me navenda Yekîtiya Êzidiyan li Efrînê ava kiribû. Lê belê piştî ku dewleta Tirk Efrîn dagir kir hate hilweşandin. Civaka Êzidî rêxistinbûna xwe li Şehbayê diparêzin û em li vê derê berxwedana xwe didomînin. Heta ku em li Efrînê vegerin wê berxwedana me dewam bike."…
*ANF*

## Jin bi saya Rêber Apo têkoşînê dikin



Jinên pêkhateyên Ereb ên herêma Şehbayê di derbarê 25 Mijdarê de gotin: "Rêber Apo pêşengtiya têkoşîna jinê kir û ji bo jinan têkoşînek mezin da. Jinên ku bi koletiyê û bi tundiya zihniyeta baviksalarî rû bi rû mane bi saya Rêber Apo têkoşînê dikin."
Jinên Ereb di derbarê 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê de diyar kirin ku li dijî tuniyê em berxwedana xwe didomînin û gotin: "Ji dîrokê heta niha di bin navê îslamê de tundiya dij mirovî li ser jinan tê kirin. Ev hîn jî didome. Divê em hemû li dijî vê yekê rabin."

**EM SERÎ NATEWÎNIN**

Berdevka Şaredariya herêma Şehbayê Xedîce Hebeş wiha got: "Em wekî jinên Şehbayê berî ku em fikir û felsefeya Rêber Apo nas bikin em bi gelek cureyên tundiyê rû bi rû diman. Lê piştî ku me felsefeya Rêber Apo nas kir êdî em li dijî tundiyê bêdeng neman û me serî netewand. Em niha jî serî natewînin."

**DIVÊ LI DIJÎ ŞIDETÊ BISEKININ**

Mamosteya Zimanê Erebî Emîne Mihemed da zanîn ku tundî divê li tu kesî neyê kirin û wiha got: "Divê li dijî tundiya li ser jinê tu kes bêdeng nemîne. Efrîn li ber çavên hemû cîhanê hat dagirkirin. Gelek kes hatin kuştin, bi tecawiz û tundiyê rû bi rû man. Her wiha bi hezaran kes hatin koçberkirin. Yên herî zêde bi tundiyê rû bi rû man jî zarok û jin bûn. Divê hemû cîhan li dijî tundiyê bisekine. Li ku dibe bila bibe, bêdengiya li dijî tundiyê nayê qebûlkirin."

**ME XWE BI RÊXISTIN KIRIYE**

Endama Komîteya Aborî ya Komîteya Meclîsa Kantona Şehbayê Menel Çepo jî wiha got: "Em wekî jinên Şehbayê yên ku li ser felsefeya Rêber Apo xwe bi rêxistin û perwerde dikin em her dem li dijî tundiya mêr disekinin. Em bang li hemû kesî dikin ku li dijî tundiyê her dem serî hildin. Heta ku em serî hilnedin em ê her dem bên çewisandin."…*JINNEWS*

## Emê têkoşîna xwe mezintir bikin



Endama Kongreya Star Hêva Erebo diyar kir, di dema rejîma Baasê de jin dibûn hedefa tundiya mêr û dewletê û got, "Şoreşa Rojava bû hêviya hemû jinan."
Endama Koordînasyona Kongreya Star Hêva Erebo bi wesîleya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li Jinê ji ANF'ê re axivî.
Erebo diyar kir ku wê têkoşîna ji bo azadiya jinê bilind bikin û got,"Mîna li gelemperiya cîhanê, li Rojava û Sûriyê jî tundiya li jinê bi sîstema serweriya mêr dewam dikir. Bi rêya qanûnan piştgirî ji vê tundiyê re dihate dayin. Di dema desthilatdariya Baasê de gelek jinên Kurd, Ereb, Suryanî hatin girtin. Rejîma Baas jî mîna gelek dewletên din dixwest her tiştên ji bo azadiya jinê tine bike."
Erebo diyar kir, hebûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li xaka Sûriyê nîşaneya jiyan û gaveke nû bû û wiha dewam kir: "Bi sedan, bi hezaran jin çûn qada wî û ew dîtin. Bandora fikir û bîrdoziya wî li jinan, li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê deng veda. Jinên Kurd hewl dan bi vî rengî xwe bi rêxistin bikin. Jinan xwe bi rêxistin dikirin, li nava malan digeriyan û hewl didan xwe nas bikin. Piştî salên 2000'î ev karê rêxistinbûnê hîn bi vekirî hate kirin. Sala 2005'an jî Yekîtiya Star bi awayekî fermî ava bû. Ji sala 2005'an heta 2016'an jinên li Rojava xwe bi navê Yekîtiya Star bi rêxistin kirin. Jinan ji aliyê civakî, hiqûqî û herî dawî jî ji aliyê aborî ve xwe bi rêxistin kirin.
Sala 2016'an jî bi kongreyê rêxistinbûna xwe berfireh kirin û bi Kongreya Star têkoşîna xwe dewam kirin. Li ser vê bingehê Kongreya Star ji siyasetê heta dîplomasî, çand, perwerde û malên jinê xwe bi rêxistin kir."

**ŞOREŞA DI NAVA ŞOREŞÊ DE**

Hîva Erebo anî ziman, li Rojava bi pêşengiya jinên Kurd karekî dest pê kir û got, "Şoreşa Rojava bû şoreşa jinê ku di nava şoreşê de şoreş pêk hat. Piştî wextekê êdî ne tenê jinên Kurd, her wiha jinên Suryanî û Ereb jî xwe bi rêxistin kirin û cihê xwe di nava şoreşê de girtin."
Di dewama axaftina xwe de Erebo bal kişand ser karên xwe yên ji niha û pê ve û got, "Têkoşîna li dijî dagirkirina Efrînê rojeva me ya bingehîn e. Jinên Efrînî sîstem û rêxistinbûna xwe li Şehbayê didomînin. Kongreya Star niha jî hem ji bo rizgarkirina Efrînê, hem jî ji bo parastina herêmên din ên Bakurê Sûriyê ji êrîşan, karê dîplomatîk, siyasî û leşkerî dike.
Bi hêza ku em ji berxwedana jinên Efrînî digirin, em ê vê têkoşîna xwe mezintir bikin."

